

Ji bo Te
ku wê bikeve azmûna millî

Azmûna millî ya perwerdeya lîseyê

Silav!

Tu wê di nêzîkî de bikevî azmûna millî ya çend dersên wek îngilîzî, matematîk û yan jî dersa Svenska som andra språk (swêdî wek zimanê duwem). Li gor ew bernameya, ku tu dixwînî, tu wê li perwerdeya lîseyê ji bo her dersekê bikevî azmûnekê, yan çend azmûnên millî.

Mebest ji azmûnan ew e, ku mamoste bikaribe bizane, ku tu çiqas karibûyî xwe bigehînî zanyariya daxwazkirî ya bernameya dersan. Her wisa, azmûn dikarin alîkariya mamosteyan bikin, daku mamoste li nîrxandina zanyariyên şagirdan, xwedî pîvaneke wekhev bin.

Naveroka bernameya dersan, ya ji bo kursên cihê û babetên wan, hem ji bo amadekirina pirsan û hem ji bo nîrxandinê, bingeha azmûna kursan e. Divê ji bo her şagirdêkî derfet were dayin, ku çend bikaribe, zanyariyên xwe nîşan bide.

Mîrov nikare bi azmûnekê hemû zanyariya şagirdî bipîve. Encama azmûna te ya netewî, beşek e giştî ya nîrxandina li vê kursê ye, ku ji bo karneya te dibe bingehe. Ji bo pûanên te yê li karneya kursê, azmûna netewî beşeke girîng e. Belê, azmûna netewî beşeke girîng e ji bo dana karnê, lê belê, mamoste wê nîrxandîneke giştî ya li ser zanyariyên te yê li her dersekê bike.

Înglîzî

Li gor ew bernameya ku tu dişopînî, li nav dema xwandina te ya lîseyê, tu wê her tenê li dersa înglîzî 5 yan li înglîzî 6 azmûna millî bidî.

Azmûna dersa înglîzî beşine yê hem azmûna danûstandina devkî û hem jî azmûna nivîskî ye, her weha jî, azmûna li têgeha xwandin û bihîstinê ye. Ji bo azmûna înglîzî 6 keresteyên xweamadekirinê hene, ku tu dikarî berî azmûnê, bi alîkariya wan, xwe amade bikî. Lê belê ev kereste li dema azmûnê bo te nayê dayin.

Swêdî û Svenska som andra språk

Li gor ew bernameya ku tu dişopînî, li nav dema xwandina te ya lîseyê, tu wê her tenê li kurs 1, yan hem kurs 1 û hem jî kurs 3, azmûna millî bidî.

Li testa li swêdî 1 û swêdî wek zimanê duwem 1, beşê testa devkî heye û her wisa jî beşê xwandin û beşê nivîsînê heye.

Testa li swêdî 3 û swêdî wek zimanê duwem 3, du beşên vê testê hene, yek bi nivîskî ye û yek jî bi devkî.

Ji bo her du testan, agehiyên kopîkirî hene, ku ji bo te li ser naveroka testan agehiyan dide û wek şagird, ji te çî tê xwastin, têde hatiye diyarkirin.

Matematîk

Li gor ew bernameya ku tu dişopîni, li nav dema xwandina te ya lîseyê, tu wê azmûna millî ya li ser kursekê, yan li ser gelek kursan bidî. Testa van kursan, wê ji gelek beşan pêk bihê, ku roja testê, sê ji van, bê alîkariya navgînên dîgîtal, têne kirin. Derfeta navbireke dirêj ya firavînê, li navbera her du beşên testê hebe, baş e.

Tu wê ji mamosteyê xwe agehiyên bêhtir wergirî

Tu wê ji mamosteyê xwe hemû agehiyên derbareyê azmûna millî û nirxandinên din ên van testan werbigirî.

Skolverket, ji hemû azmûnên millî berpirsiyar e. Lê belê, ev azmûn, ji hêla zanistgehên cihê têne hilbijartin û amadekirin. Van pirsên li azmûnan, li gelek xwendegehên cihê yê li welat, hatine meşqkirin û ceribandin. Berî van pirsên azmûnan were ber destê te, hem şagird û hem jî mamoste, dîtî û boçûnên xwe li ser van pirsên azmûnan diyar kirine. Me hevî heye, ku van azmûnên kursan bi dilê te be û derfetê bide te, ku tu bikaribî zanyariyên xwe yê derbareyê abetên cihêreng nîşan bidî.

Ew kesê li Skolverket'ê ku tu pê re bikevî pêwendiyê:

nationellaprov@skolverket.se